

MISTEFA BEGÊ KURDÎ Û ŞEŞ HELBESTÊN WÎ

✍ Hêmin OMAR

Navê wî Mistefa Begê kurê Mehmud Begê Sa'hêbqiran e. Sahêbqiran navê malbateka dêrîn û kevnê Rojhelata Kurdistanê ye.

Mistefa Beg di sala 1782yê mîladî de li Qereçolanîya paytextê Babanîyan li bajarê Silêmanî hatiye dunyayê. Di pênc saliyê xwe de çûye huca mizgefta Hacı Xan û li Silêmaniyê dest bi xwendina xwe kiriye. Di pazde salîya 'umrê xweda ji ber jêhatîyaxwe çûye qonaxa Muste'îdî ku ev qonax qonaxa berya mezûnbûna wî ye. Piştî wê Kurdî destê xwe ji hucrê ber dide ji ber ku bavê wî ji hikumeta Babanîyan wezîr bûye. Kurdî piştî çend nakokîyan, mala xwe dibe Kerkukê.

Mistefa beg ji ber evîneke sernegirtî, ta mir nezewcî ye û di helbestên xwe de mexlesa Kurdî bikaranîye.

Ji ber ku weke destûr dihate hesabandin, lazim bû ku hemû helbestvanên klasîk mexlesek ango nasanavek bo xo dabinên. Mistefa Beg ji yekî zêdetir mexlesên wî hebûn. Mexlesa êkema ku pîranî di helbestên wî de ev mexles hatiye bikaranîn mexlesa "**Kurdî**" ye. Herwekî ku tê zanîn berya Mistefa Beg jî gelek 'alimên Kurd weke mexles peyvya "**Kurdî**" bo xwe pejirandine.

Mexlesa Mistefa Beg a duwem jî "**Hicrî**" ye. Ji ber ku Mistefa Beg gelek awareyî û mişextibûn dîtîbû di helbestên xwe de nasnavê "**Hicrî**" jî wek mexles bikaranîbû.

Kurdî helbestvanêkî mezin û navdar bû ku gelek helbestvanên mîna Hacı Qadir, Nalî û Şêx Riza Telebanî pesna Kurdî diken, qedrê wî digrin û wî wek helbestvaneke mezin û rêzan dihesbînin.

Kurdî di sala 1859ê miladî de çûye ber rehma Xwudê û li bajarê Silêmanî hatiye binaxkirin. Meqbera wî halê hazir li bajarê silêmanî ye

Ji aliyê rûxsarê ve, helbestên Mistefa Begê Kurdî, ji xeynî xezelên ku rûbereka mezin ji dîwanê girtiye ji Qesîde, Mulemme' û Çarînan pêk hatine. Ji aliyê 'Erûzê ve jî, temamê helbestên wî li ser kêşa 'erûzê hatine nivîsandin. Wî bêtir helbestên xwe bi kêşa Hezec û Remelê nivîsandiye. Di nav helbestên wî de ji bil van her du kêşan kêşên din an kêşên in an jî hîç nînin.

Di nav helbestên Kurdî de sê parçe helbest jî bi mulemme' hatine nivîsandin. Parçek bi Kurdî û 'Erebî ye. Yê din bi Kurdî û Farsî ye. Parçê dawî jî bi Kurdî û Turkî hatiye nivîsandin. Wate: Niv malik bi Kurdî û niv malikê dî bi yek ji wan sê zimana ye.

Ji aliyê naverokê ve jî helbestên Kurdî zêdetir ji bingeha sofîzma maddî hatine hûnandin. Wate: Kurdî di helbestên xwe de wek helbestvanên kilasîkên din behsa jinê nake lê ciwanî û xoşîkiya Xwudê li bedena mêrxasek an însanek bi giştî dibîne. Eve jî bûye xisûsiyet û taybetmendîya helbestên Mistefa Begê Kurdî.

Ta niha têzekî doktorayê li ser rol û pêgey Mistefa Begê Kurdî hatiye nivîsandin li Zanîngeha Silêmanî li Başûrê Kurdistanê ji aliyê Naz Ehmed Se'îd ve bi navê "**Dengî Mistefa Begî Kurdî Le Şîrî Klasîkî Kurdî da**"

Digel ku gelek helbestên wî hene jî em dê li vir wek numûne şêş helbestên Mistefa Begê Kurdî raberî we bikin.

1 Ji bo bêhtir agahîyan binere: Naz Ehmed Se'îd, *Dengî Mistefa Begî Kurdî Le Şîrî Klasîkî Kurdîda, Têza Diktorayê, 2014, Silêmanî*; Mihemed Mistefa (Hemebor), *Dîwanî Kurdî (Mistefa Begî Kurdîy Sahêbqiran)*, berga 1 û 2, çapxaney Aras, hewlêr 2010; Dr. Marif Xeznedar, *Mêjûy Edebî Kurdî*, Bergî Sêyem, Bilawkrawey Aras, Çapî Yekem, Hewlêr 2003.

1- ÇÊJTIM EM RO JEHRÎ MAR

Çêjtim em ro jehrî mar û rohî şîrîn im nehat

Zamî¹ konem hate jan û merhemî birîn im nehat

Min xem im xward û xemîş xiwênî cigermî xwarde we²

Boye giryam çend beçend, firmêskî xwênîn im nehat

Xem serî lêdam³ û yarîş qet serêkî lê nedam

Sebr û hoş im royîwe⁴, xaretgerî dînim nehat

Dill desûtê⁵ çîn be çîn deşkête ser yek wek fener⁶

Xawenî rûyî ateşîn û zulfî çîngîn im nehat

Dîde⁷ wek hewrî beharan xwên debarênê û seday

Pêkenîni xunçeyî new sebz e perjîm im nehat

Goy serim⁸ çewganî⁹ mîhnet daye ber xoy ray firrand

Way 'eceb, bo şasiwarî¹⁰ xaneyî zîn im nehat?

Kewtime¹¹ wextî mirdin û xem xistimye hallî xerrxerre¹²

Kurdî bê kes xom le hîç layê seday şîn im nehat

1 **Zam:** Birîn

2 **Xwardewe:** Xwar, Vexwar

3 **Xem serî lêdam:** Xeman ziyareta min kir, Xeman serî li min dan

4 **Royîwe:** Revîye

5 **Desûtê:** Dişewite, disoje

6 **Fener:** Lampa, fanos

7 **Dîde:** Çav


8 **Goy serim:** Serê minê weke top û balon

9 **Çewgan:** Goçan, gopal

10 **Şasiwar:** Şehsiwar, mêrxas, siwareka rind

11 **Kewtime:** Ez ketme

12 **Xerrxerre:** Xirrîna ber mirinê a di hengama ruhvekişandinê de.



2- LEYLEKEY BÊ MEYLEKEY

Leylekey bê meylekey mehbûbekey 'eyyare kem
Şoxekey bedbextekey bê rehmekey xeddare¹kem

Zallimey le Xwuda netirsej kafirey bê mirwet e!
Qatillej 'aşiq kujey celladekey xûn xware kem

Gullbeden, sîmînzeqen, xet yasemen, fendeqdehen
Esmerey qed 'er'erey naz û nezaket dare kem

Leylekey, çaw mestekey, dill bestekey, newrreste²kem
Hûrîji cennatu tecrî tehtehel-enhare kem³

Newcewan, ebrokeman, şîrînzuban û nukte⁴dan
Turkreftar û perîruxsar û perçem dare kem

Ger reqîb! Sed car derim ka ya cinêw⁵im pê bida
Na'îlac im⁶ her debê bêm bo selahî⁷ kare kem

Emêsta boyeke Hîcrî⁸ jehrî dûrî çeştuwe
Tellix guftar e kelamî le'î şekkerbare kem

1 **Xeddar:** Sitemkar, zalim, zulumkar, cewrkar

2 **Newrreste:** Nûtêgihîştî, tazepêgeyîştî

3 **Cennatu tecrî tehtehel-enhare kem:** Amaje bo ayeta 136 a sureya 'Alî 'Îmran, çend beheşteq ku di jêrê wan de rubarê avê diherrikin.

4 **Nukte:** Mebest biçûktiya dev û şîrînîya ziman e.

5 **Cinêw:** Çêrr, dijûn. Xeberên nebaş

6 **Na'îlac im:** Bê derman im, naçar im, mecbur im.

7 **Selah:** Başkirin

8 **Hîcrî:** Yê ku ji welatê xwe vediqete û muhacir dibe. Kurdî mexlesa "Hîcrî" di wextê mihaciriya xwe de bikaranîye.

3- 'EZÎZAN!

'Ezîzan! Min ewa royîm¹ le latan²
Le mezllûman billa çoll bê willatan

Ke êwen padişay lutf û 'edallet
Be xwa heyfe bi rencên gedatan

Egerçî xak û xollî rehguzar im
Be serma xo guzer naka sipatan³

Were binwarre⁴ çawî pirr⁵ le xwênim
Be tefsîlat bibînin maceratan⁶

Ke min royîm Cehennem pirr meken lêm
Le min xallî meken koşk û seratan

Cefatan dam û kujtimtan⁷ be zarî
Nizûlî rehmet e cewr û cefatan

Îlahî min bibim rojê dused car
Be qurbanî geda û padişatan

Mellên⁸ kellkî nebû royî Cehennem
Ser im qellxan e bo tîrî qezatan

Nesîmî koyî to xatir deka cem
Be boy turrey peşewî paniyatan

Min im serkirdetan bo leşkirî xem
Detirsim min birrom bişkê sipatan

Eger sebr û eger dill bû, weger roh
Hemû royîm, çî ye îtir tematan⁹?

Seferman çunke rêy hat û nehat e
Du'aman bo biken êwew xudatan

Tikay¹⁰ Kurdî weha ye êwe car car
Biken yadî muhîbbî bê riyata

1 **Royîm:** Royîştim, rûniştim

2 **Le latan:** Li cem we, li ba we

3 **Sipatan:** Leşker

4 **Binwarre:** Bibîne, binêre

5 **Pirr:** Tiji

6 **Macera:** Bûyer, serhatî

7 **Kujtimtan:** Hûn ez kuştim, we ez kuştim

8 **Mellên:** Nebêjin

9 **Îtir tematan:** Îdî hûn li bendê çî ne? Ango mebestê we çiyê

10 **Tika:** Rica, daxwaz

4- SEDAY SEMTÛR E

Seday¹ semtûr ²e kellem³ germ e em şew⁴
Çirîkey bangî dill bê şerm e em şew

Be naxun⁵ karî Ferhad dê le destim
Weha şahûl⁶ e sînem⁷ nerm e em şew

Le tenhaîjî be yadî rohî Mecnûn⁸
Xeyallî geştî deşt û derme em şew

Xubarî⁹ xakî Wamîq¹⁰ ger Beheşt e
Ke qapî¹¹ to sebûrî¹² derme em şew

Le ser rû¹³m zamî¹⁴ naxûn nexşî toy best
Temay sin'atekey Azer¹⁵ me em şew

Le dewrî şem¹⁶ gerra Perwane¹⁷ nakam
Le ser rêy weslî¹⁸ to rehber me em şew

Eger çî yar û yawer¹⁹ bûn be duşmin
Xemî bê yarî bû yawer me em şew

Ke çunke boy²⁰ wîsalî toy têda ye
Nesîmî²¹ subh²² xeber awer me em şew

Ser im şorî²³ wîsalî kewt e ser baz²⁴
Dîsan Kurdî ke derdî ser me²⁵ em şew

-
- 1 **Seda:** Deng, awaz
2 **Semtûr:** Amûrekî muzikê ye
3 **Kelle:** Serî
4 **Em şew:** Ev şev
5 **Naxun:** Nînok, neynik, neynok
6 **Şahûl:** Sitûn, şaqûl, keresteyekî xanî dirûstkirine
7 **Sîne:** Sing
8 **Mecnûn:** Mebest ji Mecnûnê dilberê Leyla ye
9 **Xubar:** Toz
10 **Wamîq:** Dilbera Ezra
11 **Qap:** Nig, ling, pê
12 **Sebûrî:** Hedarî, aramî, hêminî
13 **Rû:** Rûxsar
14 **Zam:** Birîn
15 **Azer:** Bavê hezretî Îbrahîm. Sin'eteke Azer senem û pût çêkirin bû.
16 **Şem:** Mûm, çira, lampe
17 **Perwane:** Teyreke biçûke. 'Aşiqê ronahî û çirayê ye.
18 **Weslî:** Wîsal, gehîştin
19 **Yawer:** Yar, alîkar, havdem, piştevan
20 **Boy:** Bê
21 **Nesîm:** Bayê serê sibê
22 **Subh:** Sibeh, beyan
23 **Şor:** Sewda, eşq, arezû
24 **Baz:** Navê teyrekî ye.
25 **Ser me:** Serê min e.



5- EGER MEYLIT LE DİLL DERKEM

Eger meylit le dill derkem? Xerîbî koyî dillber bim
Weger satê le yadim çî ?Hîlakî jehrî ejder¹ bim

Be xeyrez² boseyî³ çawit eger qesdî⁴ wîsalit kem
Be şu'leyi qehrî⁵ tu ya Reb serapa⁶ mîslî exger bim

Eger yek lehze sistî kem le jêr barî xemî 'eşqit
Be mîslî pencere qurban be ten⁷ sûraxî⁸ xencer tim

Le ser te'rîfî⁹ egrîcet eger bêm wesfî kakoll¹⁰ kem
Be zerbî¹¹ tîxî ebroy to emin¹² meqtûlî¹³ bê ser bim

Eger yek lemhe¹⁴ xafill bim le şu'ley mahî ruxsarit
Le heşra bê nesîbî¹⁵ cennet û rûbarî Kewser¹⁶ bim

Gedayî¹⁷ koyî¹⁸ canane be şahîy 'alemî nadem
Gedayî xoştir e bo min le şahî, ger muxeyyer bim

Erê yaran! Billa "Kurdî" le botey¹⁹ fîrqeta²⁰ yek car
Xulase²¹ û bê xeş²² û, meqbûlî²³ 'alem qaltirîn zerr²⁴ bim

1 **Ejder:** Ejderha, ezya, marê mezin

2 **Be xeyrez:** Bi xeynê wî, xeyr ji wî

3 **Bûse:** Maçkirin

4 **Qesd:** Niyet, niyaz, mebest, xwestin

5 **Qehr:** Kîn

6 **Serapa:** Ji ser heta pê

7 **Ten:** Leş, beden

8 **Sûrax:** Kun, qul

9 **Te'rîf:** Danasîn, nasandin

10 **Kakoll:** Perçem. Ango zulfê zilaman

11 **Zerb:** Derb, lêxistin

12 **Emin:** Min, ez

13 **Meqtûl:** Ê ku hatiye kuştin, kujraw

14 **Yek lemhe:** Yek lehze

15 **Nesîb:** Beş, pişik

16 **Kewser:** Navê rûbarekî ye di beheştê de

17 **Geda:** Kole, bende, hejar, feqîr

18 **Koyî:** Baregah, menzil, meqam

19 **Bote:** Qalib


20 **Fîrqeta:** Dabiran, cudabûn, destjêberdan

21 **Xulase:** Pûxte, kurte

22 **Bê xeş:** Bêqirêj, temîz, paqij

23 **Meqbûll:** Tiştê ku tê qebulkirin

24 **Zerr:** Zêr, altûn



6- RENGÎ GULL JANA

Rengî gull jana!¹ Wekû ruxsareket² rengîn nîye
Şekkerî mîsrî wekû guftareket³ şîrîn nîye

Ehlî⁴ Çîn⁵ neqqaşî⁶ çak in xo, bellan⁷ teswîrî⁸ to
Neqşî xamey Kirdigar⁹ e, karî westay Çîn nîye

Men¹⁰ min 'emden deka exyarî gewc yaxo ker e?
Talîbî pûş û giya, coyay¹¹ gull û Nesrîn¹² nîye

Mentîq¹³im tey kird¹⁴ be ehwalatî terîxî şewe
Hiç wekû 'eşq ba'îsî¹⁵ can ya mayey jîn nîye

Min ke kuştay tîxî 'eşq im rojî dîwanî ceza
Bo çî şahîd bînim? Axir¹⁶ berge kem xwênîn nîye?

Meşqî¹⁷ Mensûr e le wextî kuştinîşda pêkenîn
Arê beşq¹⁸ 'eşqe 'aşiq, ser be buxz û kîn nîye

Min ke rîswa¹⁹ bûm û teplî 'aşqîm lêda îtir
"Kurdî" Hiç perway²⁰ dil û saman û can û dîn nîye

1 **Jana:** Ey riha min, ey canê min

2 **Ruxsareket:** Rûyê te

3 **Guftar:** Axaftin xweşik

4 **Ehlî:** Xelkê

5 **Çîn:** Welatê çîn

6 **Neqqaş:** Ew kesê ku resm û nexşan çêdike.

7 **Bellan:** Emma, belam, lê belê

8 **Teswîr:** Şêwe, şekil

9 **Kirdigar:** Xwedê

10 **Men':** Rêlêgirtin

11 **Coya:** Arezûmend

12 **Nesrîn:** Cûreyekî gul e

13 **Mentîq:** Zansta mentîq

14 **Tey kird:** Kurt Kir, fêm kir, derik kir

15 **Ba'îs:** Ho, sebeb

16 **Axir:** Îdî, nihayet

17 **Meşq:** Mijûlbuna ji bo hînbûna karekî

18 **Beşq:** pîrozî, heqqî

19 **Rîswa:** Bêheya

20 **Perwa:** Tirs, bak, endîşe, xof

